

Poetîkaya Helbestên Mela Ehmedê Zinarexî*


ABDURRAHMAN ADAK

1. Destpêk

Mela Ehmedê Zinarexî yek ji helbestvanên hevçax û qonaxa dawî ya tarîxa edebiyata Kurdî ye. Ew ji Kurdên Kurmanc e û li gor parvekirina îdarî ya îro xelkê wilayeta Şirnexê qezaya Hezexê ye. Erdnîgariya siruştî ya qezaya Hezexê di sêkoşeya herêmên Botan (Cizîr), Tor (Mîdyad) û Beriyê (Nisêbîn) de cih digire. Herêm, ji aliyê çandî ve di hînterlanda Torê de be jî, di serdemên tarîxî de ji aliyê îdarî ve di hînterlanda Botan de cih girtiye. Bineriha malbata Mela Ehmed digihîje gundekî Hezexê ê bi navê Hedilê. Lê ji ber ku pêşiyên wî wek pîşe mela bûne, di gundê xwe de nemane. Loma Mela Ehmed, çawa ku di helbesteke xwe de jî gotiye, di sala 1937an de li gundekî dî yê Hezexê ê bi navê Xirabêripin hatiye dinyayê.

* Ev lêkolîn, di çarçoveya projeya bi navê "Mela Ehmedî Zinarehî'nin Divanının Tahkik ve Tahlilî" de, li Zanîngeha Mardin Artukluyê di bin banê Koordînatoriya Projeyên Zanîstî de bi jimareya MAÜ-BAP-16-EF-18an hatiye amadekirin.

Li devera Hezexê wek gelek deverên din ê Kurdistanê Bakur, çanda Kurdî ya klasîk heta salên dawî parastî maye. Herçiqas ev dever di sedsala XXem de di bin desthilata dewleta modern a Tirkîyeyê de maye jî, deverê karaktera xwe ya bîngêhîn ne ji vê desthilata fermî, ji desthilateke sîvîl a bizaveke dînî ku navê wê "Neqşebendîtiya Xalidî" ye wergirtiye. Ev bizav wek bizaveke tesewufî ji aliyê Mewlana Xalidê Şehrezorî (k.d. 1826) ve hatiye damezirandin û dikare bê gotin ku bi rêya tekya û medreseyan li tevahiya Kurdistanê belav bûye.² Di serdema Mela Ehmed de jî devera Hezexê di bin desthilat û bandora nûnerekî girîng ê vê bizavê Şêx Seydayê Cizîrî (m. 1967) de bû. Bavê Mela Ehmed Mela Ûsiv, endamên dî yê malbata wî û piraniya melayên Hezexê yên wê serdemê bi Şêx Seyda ve girêdayî bûn. Mela Ehmed di atmosfereke bi vî rengî de perwerdeya medreseyê dîtiye. Pêşiyê li cem bavê xwe Mela Ûsiv Qur'ana Pîroz xwendiyê,



Mela Ehmedê Zinarexî:

“...gelek berhemên ‘ilmî nivîsîne ku piraniya wan menzûm in û bi Kurdî ne. Berhemên wî yên ilmî ev in: *Fêkiyê Narincî Mewlûda Kurmancî, Xulasa Eqîda Musilmanê Sunnî, Kurtiya Fiqha Şafî’î bi Sual û Cewab û Nezma Kurmancî, Hingivê Xweş û Esîl Rîsala Îlmê Usûl, Tefsîra Kurmancî û Tercuma Muhcetu’l-Fewaîd we’l-Esrar fî Tefsîrî Ayatî’l-Îmanî we’l-Cîhadî we’l-Îxtîbar, Telqîna Miriya û We’za Saxa û Hinek Du’a*”

piştê jî li cem melayên navdar ên herêmê yên wek Mela Mihemedê Zivingî, Mela Ebdullahê Fîrfelî, Mela Se’dullahê Basîskî, Mela Silêmanê Banihî, Mela Beşîrê Xelîlî, Şêx Xelîlê Serdêfî ku girêdana wan bi Şêx Seyda re hebû, perwerdeya medreseyê dîtîye; herî dawî li Cizîrê li cem Şêx Seyda xwendîye û ji wî îcazet stendîye. Piştî îcazetê bi rêzê li Cizîrê li medreseya Şêx Seyda, li gundên Zinarex û Mizgeftokê û li navenda Hezexê bi qasî 30 salî melatî û dersdarî kiriye. Ji ber ku destpêkirina melatiya wî Zinarex e û herî zêde li wir maye, şohreta wî bi Zinarexê çêbûye. Di sala 1991an de ji Hezexê koç Bîrecîka Rihayê kiriye û li gundekî bi navê Şekerkoçê melatî kiriye. Piştî ku di sala 1998an de li wî gundî malnişîn bûye, veqeriyaye Hezexê û giranî daye xebatên ilmî û edebî. Ev çend sal in ku Mela Ehmed tûşî nexweşiya felca qismî bûye, loma jî wextê wî bi bêhnvedanê derbas dibe.

Mela Ehmedê Zinarexî, gelek berhemên ‘ilmî nivîsîne ku piraniya wan menzûm in û bi Kurdî ne.

Berhemên wî yên ilmî ev in: *Fêkiyê Narincî Mewlûda Kurmancî, Xulasa Eqîda Musilmanê Sunnî, Kurtiya Fiqha Şafî’î bi Sual û Cewab û Nezma Kurmancî, Hingivê Xweş û Esîl Rîsala Îlmê Usûl, Tefsîra Kurmancî û Tercuma Muhcetu’l-Fewaîd we’l-Esrar fî Tefsîrî Ayatî’l-Îmanî we’l-Cîhadî we’l-Îxtîbar, Telqîna Miriya û We’za Saxa û Hinek Du’a*.³

Guman tuneye ku nivîsîna van berhemên dînî bi zimanê Kurdî cihê teqdîrê ye. Lewra bikaranîna Kurdî wek zimanê ‘ilmên dînî, hem ji aliyê pêşketina zimanê Kurdî, hem jî ji aliyê şikandina pêşqebûlên berê ve girîng e û pêwîst e. Lê Mela Ehmed di warê zimanê Kurdî de gaveke mezintir avêtîye û bi Kurdî dîwaneke helbestan jî nivîsiye ku mijara vê lêkolînê jî ev dîwan e. Nusxeyeke destxet û kamil a dîwana wî di pirtûkxaneyaya kurê wî Taha Nas de tê parastin. Hemû helbestên wî ku kojima wan 38 heb in, di nav vê dîwanê de hatine komkirin. Ji van helbestan du heb jê bi Erebbî ne.

Hey! Şairo

S Î P A N Î

Min îro şairek dît li xwe digeriya
 Li payetextê rojê
 Qefilandibû birek bêje
 Jê pirsaxwe dikir
 Xan e, xewn e yan xewnexan e
 Polisê navmirin helan dabûnê
 Pênc perê xwe nedan helanên wan
 Bi dengêkî dawidî
Hey! şairo te hay jê be
Ku tu yê di xanê de xewnek
 Di xewnê de xanek

Min îro şairek dît ferman dida peyvan
 Wan terbiye û perwerde dikir
 Dikişand hiş hestê aqilmendan
 Li hev dialandin
 Bi mifriq û pola dizotandin
 Bi hesinkariyeke Kawayî
Hey! şairo te hay jê be
Ku tu yî di xwedingehê de xwendekarek
 Di xwendekariyê de xwendegahek

Min îro şairek dît dilê wî di destê wî de
 Jê re koxek ava dikir
 Ji evîna Melê
 Ji hemiyeta Xanî
 Bi dengê Şakiro
 Bi helanê şahê dengbêja
 Şairê rû dinê Evdalê Zeynikê
 Bi qêra qulingî
Hey! şairo te hay jê be
Ku tu yê di dil de evînek
 Di evînê de dilek


Bêguman nivîsîna dîwanekê tevgereke hunerî ye û kesê ku dîwanê dinivîse hest, hizr û zanyariyên xwe di nav estetîk û poetîkayeke hunerî de tîne ziman. Çawa tê zanîn çî serdema mîrektîyan (sedsalên XVI-XIX) be, çî serdema piştî mîrektîyan (sedsalên XIX-XX) be ferq nake, di tarîxa edebiyata Kurdî/Kurmancî ya klasîk de estetîk û binyada derekî ya helbestê kêma zêde di nav dirûvekî standart de berdeyamîyek bi dest xistiye. Mela Ehmed jî wek helbestvanekî ku paşxana wî medrese ye, bivê-nevê jî vê kaniyê av vexwariye. Lêbelê guman tune ye ku di poetîkaya Mela Ehmed de çavkaniya duyem a girîng jî bizava edebî ye ku li dor dergahê Şêx Seyda ava bûye. Mela Ehmed jî vê kaniyê jî av vexwariye û ew bixwe jî bûye yek ji helbestvanên vê muhîta edebî ku paşxana wê Neqşebendîtiya Xalidî ye.⁴

Lêbelê divê em ji bîr nekin ku Mela Ehmed çî klasîk, çî modern di qonaxa dawî ya tarîxa edebiyata Kurdî de ye; loma jî bivê-nevê jî aliyekî ve dê fişara standarda kevneşopiyê kêma bibe, jî aliyê dî ve jî taybetiyên helbesta modern dê bi awayekî rengên xwe bidin helbestên wî û ev jî dê helbestên wî ji yên berê cuda bikin. Di vê lêkolînê de em dê ji aliyê estetîk û binyada derekî ya helbestê ve dîwana Mela Ehmed vekolin û digel berawirdkirina bi standarda kevneşopiyê re li ser estetîk û binyada derekî ya poetîkaya Mela Ehmed analîzê bikin.

2. Xalên bi Standardê re Hevbeş


2.1. Bikaranîna Mexlesê

Helbestvanên klasîk ên berê wek kevneşopiyekê, di cihana edebî de navekî taybet bi kar anîne û di dawiya helbestan de jî cih dane vî navî. Di çanda edebiyata klasîk de ji vî navî re “mexles” tê gotin. Helbestvanê me Mela Ehmedê Zinarexî jî li pey kevneşopîya bikaranîna mexlesê çûye û di dawiya hemû helbestên xwe de mexles bi kar aniye. Mexles bi piranî jî navên gund, eşîr, pîşe, terîqet, yan jî mîzaca helbestvanan pêk tên. Bo nimûne “Bateyî” gundê Mela Husênê Bateyî, “Xanî” eşîra Ehmedê Xanî, “Mela” pîşeya Mela Ehmedê Cizîrî, “Xelwetî”



terîqeta Şêx Şemsedînê Exlatî û “Rûhî” mîzaca Şêx Evdurehmanê Aqtepî ye. Hin helbesetvanan jî wek mexles navên xwe yên resen bi kar anîne. Wek çavdêriyeke giştî dema em li helbestvanên ku navên wan ên resen Ehmed in dinêrin, em dibînin ku wan di mexlesê de tercîha bikaranîna navên xwe yê resen kirine. Bo nimûne Melayê Cizîrî, di çend helbestên xwe de navê xwe Ehmed bi kar anîye. Şêx Ehmedê Feqîr (m. nîveka yekem a sedsala XIX) di tevahiya dîwana xwe de ev rêbaz şopandiye. Mela Ehmedê Nalbend (m. 1963) û jî helbestvanên îroyîn Mela Ehmedê Xelatî bi heman şiklî di helbestên xwe de mexlesa “Ehmed” bi kar tîne. Helbestvanê me Mela Ehmedê Zinarexî jî bûye yek ji endamên vê komê û di helbestên xwe de wek mexles navê xwe yê resen tercîh kiriye. Li jêrê ji bo bikaranîna vê mexlesê di helbestên wî de ji dîwana wî nimûneyek hatiye dayin:

Dibê **Ehmed** ku bêhiş bê di ewil da
 Çimkî kerba gelek zîl dan di dil da
 Ji Rebbê xwe dikê hêvî û zarî
 Li wî negrê eêfû bikê di vir da
 Wek şêwazeke bikaranîna mexlesê, tê çavdêrîkirin ku Mela Ehmedê Zinarexî jî wek Melayê Cizîrî, di hin helbestan de mexlesa xwe du caran, di hinan de jî sê caran bi kar anîye. Şêwazeke di jî ew e ku Mela Ehmed, di du helbestan de şûna ku rasterast cih bide mexlesa xwe, bi rêya herfên alfabayê mexles bi kar anîye. Ev jî terzekî klasîk e ku di serî de Feqiyê Teyran, komek ji helbestvanên Kurdan serî lê dane. Çawa li jêrê jî tê dîtîn wî di cihê de gotiye “**Elif û dal û nûn û sîn**” û di cihê de jî gotiye “**Elif û hê û mîm û peyre dalê**”. Di cihê ewil de **Elif û dal** herfên ewil û dawî yên navê wî (Ehmed), **nûn û sîn** jî herfên ewil û dawî yên paşnavê wî (Nas) ne. Di cihê duyem de jî **Elif, hê, mîm û dal** her çar herf in ku navê wî ji wan pêk tê:



Mela Ehmedê Zinarexî

Elîf û dal û nûn û sîn

Ahîn dikê ji qelbê hezîn
 Dijmin ser de tînê birîn
 Te dí Rebb dermanek lê kir

Elîf û hê û mîm û pey re dalê

Ji derda ew nexweş bû lew dinalê

2. 2. Teşeyên Nezmê

Piraniya teşeyên nezmê ku nişaneyên girîng ên binyada derekî ya helbesta klasîk in, paralelî standarda kevneşopiyê di dîwana Mela Ehmed de hatine bikaranîn. Ji aliyê teşeyên nezmê ve di dîwana Mela Ehmed de 14 heb qesîde, 10 heb qesîdeyên musemmet, 8 heb murebba, 2 heb mesnewî, 2 heb muxemmes, museddesek û helbesteke bi teşeyeke taybet (ev helbest bi Erebi ye) cih digirin. Eger ev teşe li gorî yekeyên wan bîn dabeşkirin, dê bê dîtîna ku helbestvan zêdetir teşeyên ku ji beytan pêk tên bi kar anîne ku ew jî bi giştî 27 helbest in (4 heb qesîde, 10 heb qesîdeyên musemmet û 3 heb mesnewî). Heçî teşeyên ku ji bendan pêk hatine ew jî 10 heb in. (7 heb murebba, 2 heb muxemmes û museddesek). Ji murebbayên wî 5 heb jê mutekerrir,

3 heb jî muzdewic; her du muxemmes muzdewic û museddes jî mutekerrir e. Hin murebbayên wî jî (helbest 17, 18) bi qafiyeyeke xweser (xxaa, xxbb) hatine nivîsîn. Çawa tê dîtîna ji aliyê bikaranîna teşeyên nezmê ve cudakirina dîwana Mela Ehmed ji dîwanên berê ne pêkan e.

3. Xalên ji Standardê Cuda**3. 1. Tertîba Kronolojîk**

Di dîwanên berê de helbest li gorî herfên qafiyeyan dihatin rêzkirin. Pêşî helbestên bi qafiyeya **Elîfê**, piştî yên bi qafiyeya **Bê** cih digirtin û vê rêbazê heta ku bigihe herfa **Yê** dom dikir. Di dîwana Mela Ehmed de helbest li gorî tarîxa nivîsînê bi awayekî kronolojîk cih digirin. Mela Ehmed di dawiya piraniya helbestên xwe de wek têbîniyekê tarîxa nivîsîna helbestan nivîsiye. Di dîwanên berê de gelekî asayî ye ku helbestên ku helbestvan di ciwanîya xwe de nivîsîne, di dawiya dîwanê de cih bigirin, yan jî berevajiyê wê çêbibe. Lêbelê helbestên Mela Ehmed kronolojîk in. Ev şewaza wî ya tertîba dîwanê orjînal e. Lewra di standarda dîwanên klasîk de tertîb ne bi vî awayî ye. Çi tercîheke şexsî be, çî jî bandora helbesta modern be ferq nake, ev yek dîrketina ji kevneşopiyê û zêîfbûna fişara wê kevneşopiyê nişan dide.

Bêguman ev rêbaza tertîbê jî ber ku der heqê helbestvan û hunera wî de hin zanyariyên şênber radestî me dikin, gelekî girîng e. Lewra li ser van zanyariyan gelek nirxandin dikarin bîn kirin. Li gorî tarîxên nivîsîna helbestan derdikeve holê ku Mela Ehmed helbesta xwe ya yekem di sala 1988an de û ya dawî jî di sala 2011an de nivîsiye ku ev mawe jî beramberî 23 salan tê. Dîsa dema em lê dinêrin, em dibînin ku wî piraniya helbestên xwe di navbera salên 1988-1992yan de, di çar salan de nivîsîne. Piştî 1992yan heta bi 2011an, yanî di 19 salan de tenê 9 helbest nivîsîne. Bi vî awayî jiyana wî ya helbestan li ser du qonaxan dikare bê dabeşkirin. Qonaxa yekem kurt e, lê di vê qonaxê de helbestvan pir çalak e. Qonaxa duyem dirêj e, lê di vê qonaxê de helbestvan jî çalakiya edebî dîr maye. Sedemê vê jî ew e ku wî di qonaxa duyem de zêdetir berhemên 'ilmî nivîsîne. Ev zanyariyên

me yên der heqê van her du qonaxan de, ji bo ku şopandina guherînên di şêwaz û mijarên wî de derfetekê pêşkêşî me dikin, gelekî girîng in. Tê çavdêrîkirin ku Mela Ehmed di qonaxa xwe ya duyem de ji aliyê hêza edebî ve zêdetir kemiliye û êdî qesîdeyên standart û herikbar ên edebiyata klasîk û musemmetên mutekerrir nivîsîne.

Di dîwanên berê de tarîxa nivîsîna helbestan, bi piranî di nav helbestan de bi hesabê Ebcedê yan jî bi awayekî aşkera dihat îfadekirin. Mela Ehmed tenê di, di helbesteke xwe de (helbesta 19em a bi sernavê *Tarîxa Hicrî weya Umrî*) serî li rêbazeke bi vî rengî daye û di wê helbestê de tarîxa nivîsîna wê (sala 1409an) û temenê xwe diyar kiriye (53 sal).

3. 2. Navê Dîwanê û Sernavên Helbestan

Berevajiyê kevneşopîya dîwanên berê, di dîwana Mela Ehmed de di serê hemû helbestan de sernavên ku mijara helbestê nişan didin hatine bikaranîn. Bo nimûne, sernavê helbesta yekem a dîwanê “Şîreta Musulmana” ye. Ji ber ku tema û mijarên dîwanên berê standart bûn û tertîb û rêzkirina helbestan jî hinekî bi van tema û mijaran ve têkildar bû, danîna sernavan nebûbû kevneşopî. Dikare bê gotin ku di piraniya dîwanan de dîn, evîn, siruşt û hikmet temayên sereke bûn û bi piranî helbest bi heman rêzê dihatin rêzkirin. Lêbelê ji ber ku di sedsala me de hin helbestvanan mijarên siyasî, civakî û takekesî jî xistin nav dîwanan, van helbestvanan hinekî jî bi teqlîda helbesta modern îhtiyac bi danasîna mijara helbestê dîtî û ji bo vê mebestê jî sernav bi kar anîn. Ev yek wek taybetiyeye xweser a dîwana Mela Ehmed jî derdikeve pêş. Dikare bê gotin ku wî tenê di helbesteke xwe de cih daye mijarên lîrîk ên li ser terzê berê. Jixwe sernavê wê helbestê jî kiriye *Şî’ra Işq û Evînê*. Wekî dî tevahiya dîwana wî ji tema û mijarên dînî, civakî û takekesî pêk tên. Loma wî di tevahiya helbestên xwe de sernav bi kar anîne.

Bikaranîna navekî ji bo dîwanê (*Dîwana Şî’r û Xezelê Modern û Îstratîcî*) jî di vê çarçoveyê de divê bê hizirkirin. Eşkere ye ku Mela Ehmed di çarçoveya şêwaz û temayên nû ên dîwana xwe de helbestên xwe wek helbestên modern û stratejîk bi nav kirine. Ji ber ku berê ji bo dîwanan navên tay-

bet nedihatî danîn, bikaranîna navekî ji bo dîwanê jî wek cudahiyeke Mela Ehmed ji helbestvanên berê û xweseriyeke wî ya edebî derdikeve pêş. Ji ber ku Mela Ehmed di helbesteke xwe de navê Cegerxwîn bi eşkereyî daye, dikare bê texmînkirin ku di bikaranîna navekî ji bo dîwanê û sernavan ji bo helbestan de Cegerxwîn jî ji bo Mela Ehmed çavkaniyeke edebî ye.

3. 3. Feraxeta ji Mûsîqiya Helbestê

Mela Ehmed helbestên xwe di çarçoveya edebiyata klasîk de li gorî wezna erûzê nivîsîne û bi vî awayî xwestiyê rîtm û melodiyekê bi dest bixe ku ev yek wek mûsîqiya helbestê jî tê binavkirin. Eger em ji aliyê wezna erûzê ve li helbestên wî binerin, wêneyeke weha derdikeve meydanê: Ji helbestên wî 20 heb bi behra hezecê, 4 heb bi behra remelê, 4 heb bi behra recezê û 9 heb jî bi awayekî têkel bi behrên besît (mustef’îlun fa’îlun) û hezecê (mefa’îlun fe’ûlun) hatine nivîsîn. Di van 9 helbestan de pêşî tef’îleyeke çar hêceyî (mustef’îlun û mefa’îlun) û peyre jî tef’îleyeke sê hêceyî (fa’îlun û fe’ûlun) bi awayekî têkel hatine bikaranîn. Di dîwanê de helbestek jî bi du qalîban hatiye nivîsîn. Nîveka yekem a vê helbestê bi remelê û nîveka duyem jî bi hezecê ye. Eger em bi giştî li behr û qalibên erûzê yên dîwana Mela Ehmed binerin, tabloyeke wiha derdikeve meydanê:

Behr	Wezn
1. Hezec (21)	1. mefa’îlun Mefa’îlun (11) 2. mefa’îlun Mefa’îlun fe’ûlun (10)
2. Besît û Hezec (9)	1. mustef’îlun fe’ûlun mustef’îlun fe’ûlun (9)
3. Remel (5)	1. fa’îlatun fa’îlatun fa’îlatun fa’îlatun (2) 2. fa’îlatun fa’îlatun fa’îlatun fa’îlun (1) 3. fa’îlatun fa’îlatun fa’îlatun (1) 4. Fa’îlatun fa’îlatun fa’îlun (1)
4. Recez (4)	1. mustef’îlun mustef’îlun mustef’îlun (2) 2. Mustef’îlun mustef’îlun (2)

Di helbestên Mela Ehmed de du xalên bi weznê ve têkildar balê dikişînin. Xala yekem ew e ku wî misrayên helbestê xistine qalibên tef'îleyan/parçeyan, lê tef'île nexistine qalibên kurtî û dirêjîya hêceyan. Bo nimûne eger kêş “mefa'îlun Mefa'îlun fe'ûlun” be, wî misraya helbestê kiriye sê parçe/tef'île ku her du parçeyên pêşî çarhêceyî, parçeya dawî jî sêhêceyî ye. Piştî ku helbest bi vî awayî dîzayn kir, îcar zêde guh nedaye şablona kurtî û dirêjîya hêceyên tef'îleyan. Li cihê hêceya kurt, ya dirêj û li cihê ya dirêj, ya kurt bi kar aniye ku ev jî tê wateya hebûna zîhaf û îmaleyan. Xala duyem jî di helbestên Mela Ehmed de jimara hêceyên ku ji bo ahenga helbestê dengdêrên wan hatine avêtin û herfa bêdeng a mayî jî bi hêceya berî xwe, yan jî ya piştî xwe ve hatiye zeliqandin û bi vî awayî du hêce wek hêceyekê hatine qebûl kirin gelek in. Bêguman dema du hêce wek hêceyekê tèn qebûl kirin, hem di xwendinê de hem jî di fêmkirinê de hin zehmetî derdikevin holê. Di zanista edebiyata klasîk de ev her du xal wek qusûrên kêşê tèn qebûl kirin. Lêbelê divê bê gotin ku hin helbestên wî jî aliyê rîtm, melodî, aheng û mûsîqîya kêşê ve gelekî herîkbar û serkeftî ne. Helbestên bi sernavê “Şî'ra Seyda Muhammed Se'îd” û “Sifra Xwarinê” jî bo van helbestên wî wek nimûne dikarin bê dayin.

Di dîwana Mela Ehmed de wek hêmaneke aheng û mûsîqîya helbestê serî li qafiyê û redîfê jî hatiye dayin. Wek çavdêriyekê dikare bê gotin ku di dîwana Mela Ehmed de bi piranî qafiyê xîtabî çavan dikin. Wî di bikaranîna qafiyeyê de girîngî bi hevbeşîya herfan daye. Di van rewşan de herfên qafiyeyê hevbeş in, lêbelê dengdêrên wan cuda ne. Ev yek di helbestên ku herfa **Yê** wek qafiyê hatiye bikaranîn de bi taybetî dikare bê dîtin. Di van helbestan de di herfa **Yê** de hevbeşî heye. Lêbelê jî ber ku di Kurmancî de carinan dengdêrê “î”, carinan jî dengdêrê “ê” tê dawîya **Yê** di redîfa wê de hevbeşî tune ye.

Wek encam, ji taybetiyên wezn û qafiyeya helbestên Mela Ehmed derdikeve holê ku wî helbest jî bo îfadekirina hizrên xwe yên dîni û civakî wek amûrekê bi kar aniye. Armanca wî ya sereke ew e ku ew bi rêya helbestê mesajên xwe bide û hizrên xwe di nav civakê de belav bike. Loma di dîwana wî de ne huner, hunermend li pêş e. Hunermend,

ji bo ku hin hizrên xwe xweşik îfade bike, ji hunera mûsîqîya helbestê hinekî feraxet kiriye.

3. 4. Helbestên Mutewwel

Ji aliyê binyada derekî ya helbestê ve taybetiyeke dîwana Mela Ehmed ew e ku helbestên wî dirêj/mutewwel in. Herçiqas qesîde û murebbe'ên wî nêzî standardê jî bin, (Dirêjîya qesîdeyan di navbera 12-42 beyt û ya murebbayan di navbera 7-25 bendan de diguhere.), lêbelê helbestên wî yên ku bi teşeya qesîdeyên musemmet hatine nivîsîn ji standardê dirêjtir in. Dirêjîya van helbestan di navbera 42-58 beytan de diguhere. Her du muxemmesên wî jî di kategoriya helbestên dirêj de ne ku yek ji wan 46 bend ya dî ya bi sernavê “Qisseta Se'îdê kurê Cubeyr Digel Heccacê Zalim” 96 bend in. Ev muxemmesa dawî helbesta herî zêde dirêj a dîwanê ye û wek menzûmeyeke serbixwe jî dikare bê hesibandin. Bi vî awayî tê dîtin ku ev helbestên wî dikevin kategoriya helbestên mutewwel. Eşkere ye ku Mela Ehmed jî vî terzî hez kiriye û loma jî di çend cihên dîwanê de wî bixwe jî bal kişandiye ser dirêjîya helbestê. Di van misrayên jêrîn de ev yek dikare bê dîtin:

Ehmed bes e niha kin ke
Çîrok xweş e weqit teng e
Me îş heye lî me dereng e
Wek qisseta Cegerxwînî

3. 5. Zimanê Sade û Rojane

Ji ber ku di dîwana Mela Ehmed de helbestên lîrîk kêr in şêwaza wî jî ne şêwazeke bicoş û xeyalî ye. Zimanê helbestên wî sade û vekirî ye. Ji ber ku xwestiye mesajên xwe bigihîne gel, serî li zimanekî hunerî û giran nedaye. Li şûna wê zimanê rojane û herêmî bi kar aniye. Di vê çarçoveyê de, berevajiyê helbestên berê di nav helbestên wî yên Kurdî de îfade û hevokên Farisî û Erebi gelekî hindik in. Bêguman jî vî aliyê ve jî helbestên Mela Ehmed jî standarda helbesta klasîk cuda dibin.

4. Encam

Mela Ehmedê Zinarexî, yek ji helbestvanên hevçaxê devera Hezexê ye ku bi Kurdiya Kurmancî digel çen-

dîn berhemên ‘ilmî dîwaneke helbestan jî nivîsiye. Di çarçoveya estetîk û binyada derekî ya helbestên wî de poetîkaya Mela Ehmed ji du çavkaniyan sûd wergeriye: Yek jê standarda edebî ya tarîxa edebiyata Kurdî, ya dî jî atmosfera muhîta edebî ya dergahê Şêx Seyda (m. 1967) ye. Lêbelê ji ber ku Mela Ehmed di qonaxa dawî ya tarîxa edebiyata Kurdî de jiyaye, ji aliyekî ve kêmbûna fişara standardên berê, ji aliyekî ve jî bandora hizrên nû û helbesta modern ên vê qonaxê kirine ku di estetîk û binyada derekî ya helbestên wî de hin cudahî derkevin holê. Dema em li estetîk û binyada derekî ya helbestên wî dinerin, em dibînin ku bikaranîna mexlesê û teşeyên nezmê bi tevahî bi standarda kevneşopiyê re hevbeş in. Lêbelê terciha tertîba kronolojîk li ser tertîba alfabetîk, bikaranîna navekî ji bo dîwanê û bikaranîna sernavan ji bo helbestan, ji bo belavkirina mesajê feraxeta ji mûsîqîya helbestê ya ku bi wezn û qafiyeyê tê bidestxistin, nivîsîna helbestên mutewwel û bikaranîna zimanekî sade, rojane û dûrî ‘Erebî û Farisî wek xweseriya poetîkaya Mela Ehmed ku derî standarda kevneşopiyê ne derdikevin pêş.

Çavkanî

Adak, Abdurrahman, "Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola Wî di Edebiyata Kurdî de", *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre*, Edîtor: M. Nesim Doru, Stenbol: 2012.

Adak, Abdurrahman, "Malbata Zêbarîyan û Basreta "Paytexta Neqşebendîyan"-I -Heta bi Serdema Postnîşîniya Malbata Zêbarîyan li Dergahê Basretê" *Nûbihar*, s. 2009

Nas, Taha, "İdilli Bir Alim: Molla Ahmed Nas ve Eserleri", *Geçmişten Günümüze İdil Uluslararası Geçmişten Günümüze İdil Sempozyumu Bildirileri*, Edîtor: M. Nesim Doru, Stenbol: 2011.

Zinarexî, Mela Ehmed, Dîwan, (Pirtûkxaneyaya taybet a Taha Nas)

Jêrenot

- Ji bo agahiyên berfireh bnr. Abdurrahman Adak, "Malbata Zêbarîyan û Basreta "Paytexta Neqşebendîyan"-I -Heta bi Serdema Postnîşîniya Malbata Zêbarîyan li Dergahê Basretê" *Nûbihar*, s. 2009, h. 107, r. 58.
- Ji bo jiyana û berhemên Mela Ehmed bnr. Taha Nas, "İdilli Bir Alim: Molla Ahmed Nas ve Eserleri", *Geçmişten Günümüze İdil Uluslararası Geçmişten Günümüze İdil Sempozyumu Bildirileri*, Edîtor: M. Nesim Doru, İstanbul 2011, r. 363-371.
- Derheqê vê muhîta edebî de ji bo agahiyên berfireh bnr. Abdurrahman Adak, "Li Cizîrê Muhîteke Edebî: Dergahê Şêx Seyda û Rola Wî di Edebiyata Kurdî de", *Bilim Düşünce ve Sanatta Cizre*, Edîtor: M. Nesim Doru, Stenbol: 2012, r. 465-486.

Kevoka kovî

H U S E Y N Ş E M R E X Î

Firî hey firî kevoka kovî
Ku xwe filitand ji destê rovî...

Rovî bang kirê; dostê, kevokê!
Hey xayînokê, çima revokê?!

Mîna da nanê te, danê te danî
Çima revok î, te çi kêmanî?!

Kevokê go; karê rovî rav e
Hevaliya te ney ji hinav e

Nê tu serbirrê bira û bav e
Ew nan û dana ji min ra dav e

Ber'ya tu serî li min bifirîn
Ez dê firim, her azadî firîn!

Kovî me kovî, kevoka kovî!
Cê min ne li ba roviyê hovî

Ma ne gotine; "her teyr difire
Difire her teyr, bi refê xwe re".

Her dê firim nav refê kevokan
Namînim li ba we pîrhevokan!

04.02.2017